



## Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn

15ê-30 Îlonê, 2022

### 15ê Îlonê, 2022

Malbata Şenyaşaran di roja 556emîn a Nobeta Edaletê ya ku di 9ê Adara 2021an de li ber Edliyeya Rihayê dest pê kir de çalakiya "bêdengiyê" li dar xist.

Malbata Şenyaşaran her roj daxuyaniyê didin çapemeniyê. Vê carê Ferît Şenyaşar ji ber ku daxwazên wan bê bersiv dimînin wekî bertek, bi qaxezekî ku li ser wê "Edalet" dinivîse deqeyekê neaxivî.

Êrîşa ku di 14ê Hezîrana 2018an de di dema gera hilibijartinê ya Parlamentê AKPyê yê Rihayê Ibrahim Halil Yıldız de pêk hat veguherî şerê çekdarî û birayê Yıldız Mehmet Şah Yıldız, esnaf Haci Esvet Şenyaşar û kurên wî Adil û Celal Şenyaşar jiyana xwe ji dest dan. Fadil Şenyaşar ê ku di pevçûnê de bav û 2 birayên xwe winda kir û bi xwe jî birîndar bû, di 17ê Hezîranê de piştî ku ji nexweşxaneyê derket, hat binçavkirin û ji aliyê dadgehê ve hat girtin. Emîne Şenyaşar ku di encama vê êrîşê de hevserê wê û 2 kurên wê jiyana xwe ji dest da û kurê wê Ferît Şenyaşar ku bi birîndarî ji êrîşan rizgar bû, li ber edliyeyê nobeta edaletê dimeşînin.

Dosyeya lêpîrsîna der barê êrîşê de ku ev 3 sal û 3 meh in dom dike veşartî ye.

### 16ê Îlonê, 2022

#### Di daxuyaniyê de 9 kes hatin binçavkirin.

Rêxistina Navçeya Esenyurtê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) li hember Dibistana Seretayî ya binavê İbrahim Ozaydin bi daxwaza "perwerdeya bi zimanê dayikê" daxuyaniya çapemeniyê de. Polîsên ku mudaxaleyî daxuyaniyê kir neh kes binçav kirin.

Kesên ku xwest daxuyaniyê bidin ji aliyê polîsan ve hatin derbkirin.

Navê kesên ku hatin binçavkirin wiha ne: Gamze Kaya, Çayan Yılmaz, Dinçer Gün, Metin Burukan, Medet Duzenli, Sinan Polathan, Murat Guven, Ayten Yılmaz û Welat Ekmekçi. Kesên ku hatin binçavkirin peşî li nexweşxaneyê Dewletê ya Beylikduzuyê hatin muayenekirin, piştê li Qereqola Kiraçê ifade dan û hatin berdan.

### 17ê Îlonê, 2022

#### Du konserên Mohsen Namjoo hatin betalkirin

Muzîkjenê Îranî Mohsen Namjoo dê di navbera 2-10ê Kanûnê de li Stenbol, Bursa, Enqere, Konya û Wanê derketa ser dikê. Di 15ê Îlona 2022an de bi piştgiriya rojnameya Yenî Akitê Serokê Sendîkaya Karkerên Diyanetê Mustafa Çopursuz û rêxistina bi navê "Tevgera Mudafa-î İslamê" ji bo konsera Namjoo betal bibe kampanyayek da destpêkirin. Van komên navborî bi hinceta ku "hunermend di stranên xwe de ayetên Quranê bi kar tîne" daxwaza betalkirina konseran kir.

Ji ber betalbûna konseran firotina bilêtan a li ser malpera [iletix.com](http://iletix.com)ê hat sekinandin.



Bi vî rengî, ji Gulana 2022an û vir ve bi giştî 10 festîval û 18 konser hatine betalkirin.

### **Destûr nedan meşa li hember birrîna daran a li Şîrnexê**

Li herêmên Besta, Cûdî û Gebarê yê Şîrnexê zêdeyî 2 salan e dar tîn birîn û daristan tîn tunekirin. Bi daxwaza rawestandina birrîna daran meşek hat lidarxistin, lê ji bo meşe destûr nehat dayîn.

Hêzên ewlehiyê ragihand ku ji bo meşê destûra walfîtiyê tune ye û hemû rê bi wesayîten zirxî girtin. Li hemberî kesên ji çar aliyê Tirkiyeyê hatibûn û xwestin ku ber bi Cûdîyê ve bimeşin ava bi zext û gaza bîberê hatin bikaranîn.

### **20ê Îlonê, 2022**

#### **Dadgeha Makezagonê biryar da ku mafên Gulsûm Elvan hatine binpêkirin**

Dadgeha Makezagonê (AYM) biryar da ku polîsên ku di sala 2017an de di xwepêşandaneke de milê Gulsum Elvanê de şikandiye, "qedexeya muameleya xerab" binpê kirine. Gulsum Elvan dayika Berkîn Elvan e ku di sala 2013an de di berxwedana Geziyê de bi fişeka gazê ji serê xwe birîndar bû û jiyana xwe ji dest da. Dadgehê biryar da ku Elvan 20 hezar lîre tezmînet bistîne û her wiha dosyaya lêpîrsînê ya girtî ji nû ve bê vekirin.

Gulsum Elvan di 11ê Tebaxa 2017an de beşdarî xwepêşandana piştgiriya bû ku ji bo Nuriye Gulmen û Semih Ozakça hat lidarxistin. Akademîsyen Nuriye Gulmen û mamoste Semih Ozakça di çarçoveya Rewşa Awarte de hatibûn îxracandin ku piştî peyana derbeya 15ê Tîrmehê hatibû îlankirin. Gulmen 9ê Mijdara 2016an de, Ozakça di 23ê Mijdara 2016an de bi pankarta "Ez karê xwe bi şûn ve dixwazim" li ber Bîrdariya Mafên Mirovan a li Kolana Yukselê ya li Enqereyê dest bi çalakîyê kiribû û di meha Berfanbarê de çalakiya xwe veguherandibûn greva birçîbûnê. Gulmen û Ozakça di çalakiyên xwe de gelek caran hatin binçavkirin.

Di tevahiya vê pêvajoyê de ji bo Gulmen û Ozakça çalakiyên piştgiriya hatin lidarxistin. Di xwepêşandana li Kadikoya Stenbolê de destê çepê yê Gulsum Elvan şikestibû. Elvan 3 saetan dest bi kelepçe ma piştê teşxîsê lê hat dayîn ku mil û sermilê wê şikestine.

Li ser gilîkirinê, Walfîtiya Stenbolê destûr neda ku Serdozgeriya Komarê ya Anadoluyê ya Stenbolê der barê polîsan de pêvajoya hiqûqî bide destpêkirin û Elvan li ser vê yekê serî li Dadgeha makezagonê da.

#### **Ji bo stranbêj Yeşim Salkim bi hinceta ku heqaret li Serokomar kiriye daxwaza girtîgehê hat kirin.**

Seyhan Soylu ku di cîhana magazînê de bi navê Sîsî tê naskirin, bi rêya parêzerê xwe serî li dozgeriyê da û bi hinceta ku heqaret li Serokomar Erdogan kiriye giliyê stranbêj Yeşim Salkim kir.

Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê bi destûra Wezareta Dadê der barê Salkim de lêpîrsîn da destpêkirin. Di îdianameyê de hat xwestin ku ji ber sûcê "heqaret li Serokomariyê kiriye" li Yeşim Salkimê ji salek û 2 mehan heta 4 sal û 8 mehan cezayê girtîgehê bê birîn. Salkim dê bêyî ku bê girtin bê darizandin. Ew dê di 8ê Mijdarê de derkeve pêşberî dadger.



### **Li Stenbolê polîsan mudaxeleyî xwepêşandana jinên Îranî ya ji bo Mahsa Aminî kir: 20 kes hatin binçavkirin**

Komek jinên Îranî li Taksîma Stenbolê xwest ku ji bo Mahsa Aminî ya ku li Îranê bi hinceta beşek ji porê wê xuya ye ji aliyê polîsên exlaqê ve bi lêdanê hat qetilkirin çalakiyekê li dar bixin. Koma jinan rastî mudaxeleya polîsan hat. Tevî hemû astengiyên jinan li Kolana Îstîklalê dest bi meşê kir. Piştî jin ji aliyê polîsan ve hatin dorpêçkirin.

Bi pêşengiya rêxistinên jinan ên sîvîl, ji bo Mahsa Aminî li gelek bajarên Tirkiyeyê bi awayekî hemwext çalakî hatin lidarxistin. Di nav de bajarên wekî Edene, Enqere, Antalya, Artvîn, Bartin, Bursa, Çanakkale, Stenbol, Entab, Mêrsîn û Samsun hebûn.

Aminî di 13ê Îlonê de ji aliyê dewriyeyên Îrşadê yê bi navê "Polîsên Exlaqê" ve bi hinceta ku "riayetî rêzikên der heq cilûbergan de nekiriye" hate binçavkirin û di heman rojê de ji nişka ve nexweş ket û ji ser hişê xwe çû. Polîsan ragihand ku Aminî piştî sê rojên di komayê de di 16ê Îlonê de li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da.

### **21ê Îlonê, 2022**

#### **Polîsan beriya dozê mudaxeleyî Dayikên Şemiyê kir: 16 kes hatin binçavkirin**

5emîn danişîna doza der barê 46 kesên ku di mudaxaleya polîsan a li çalakiya Dayikên Şemiyê ya heftêya 700emîn de hatibûn binçavkirin pêk hat. Beriya dozê komekê xwest ku daxuyaniya çapemeniyê bidin lê belê destûr nehat dayîn.

Di encama mudaxeleya polîsan de Endamê PMyê ya Partiya ÇEPGIR (SOL PARTÎ) Alper Taş û rêveberên partiyê, Serokê Basîn-Îşê ya DÎSKê Faruk Eren, parêzerê dozê Meriç Eyuboglu û parêzer Efkân Bolaç jî di nav de 16 kes hatin binçavkirin. Kesên hatin binçavkirin piştî îfadeya wan hat girtin serbest hatin berdan.

Dayikên Şemiyê di 27ê Gulana 1995an de li Qada Galatasarayê dest bi çalakiya rûniştinê kirin û xwestin ku kujerên xizmên wan ên di qirkirinê siyasetî yê kiryar nediyar de hatine qetilkirin bînin dîtin û darizandin. Koma ku di 13ê Adara 1999an de ji ber destwerdana polîsan çalakiya rûniştinê rawestandibû, di 31ê Çileyê 2009an de dîsa dest bi kombûnê kir. Di 25ê Tebaxa 2018an de ango di heftêya 700emîn a çalakiyê de, dîsa êrîşa polîsan pêk hat û 46 kes hatin binçavkirin. Di 23ê Mijdara 2020an de bi îdfaya ku "tevlî civîn û meşên derqanûnî yê bêçek bûne û li gel hişyariyê belav nebûne", ji ber dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanê doz li girtiyên hatibû vekirin.

#### **Doza qetla Musa Anter bi hinceta ku demborî bûye betal bû**

Doza der barê 18 bersûcên qetla nivîskar Musa Anter û birîndarkirina endamê Lijneya Navendî ya Reveberiyê ya AKPê Orhan Mîroglu bi hinceta ku demborî bûye hat betalkirin. Di nav van 18 bersûcan de Mahmut Yıldırım ê bi nasnavê 'Yeşil' jî hebû.

Rojnameger û nivîskar Musa Anter di 20ê Îlona 1992an de li Amedê ku ji bo beşdarbûna Mîhrîcana Çand û Hunerê lê bû, di encama êrîşeke çekdarî de jiyana xwe ji dest da. Nivîskar Orhan Mîroglu di êrîşê de bi giranî birîndar bû. Bi salan, di dosyaya bi hejmara 1992/2598an a lêpîrsînê ku piştî bûyerê ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Amedê ve hatibû destpêkirin de, "kiryarê vê cîneyetê nediyar" ma.

(Ji bo agahiyên berfireh ên der barê dozê de: <https://www.failibelli.org/dava/musa-anter-davasi>)



**22ê Îlonê, 2022**

**Rojnameger Nurcan Yalçın ji ber nûçeyên xwe hat darizandin û cezayê girtîgehê lê hat birîn.**

Ji ber nûçeyên wê yê der barê navçeya Sûrê ya Amedê de ku di navbera salên 2015-2016an de weşiyane, bi îdiaya ku "bi dilxwazî û zaneyî alîkariya rêxistina terorê kiriye" 2 sal û 6 meh cezayê girtîgehê li Rojnameger Nurcan Yalçın hat birîn.

Yalçın ji ber nûçeyên wê yê di Ajansa Nûçeyan a Jinê (JÎNHA) de weşayabûn, li 4emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê bi daxwaza ji 7,5 salan heya 15 salan cezayê girtîgehê dihat darizandin. Dozgerê danişînê di nirxandina xwe ya esasî de, hevdîtinên Nurcan Yalçın ên di Cotmeh û Mijdara 2015an de li navçeya Sûrê bi jinan re pêk anîbûn, wekî delîl nîşan da. Dozger îdia kir ku rojnameger Yalçın bi "endamên rêxistina terorê ya çekdar" re hevpeyvîn kirine, di axaftinên xwe de piştgiriya manewî ya endamên rêxistinê kiriye û dîmenên teşwîqkirina têkoşîna çekdarî an jî serhildanê tomar kiriye.

Li aliyê din Rojnameger Yalçın di parastina xwe de diyar kir ku di dema ew dîmen hatine kişandin de ew li JINHAyê wekî kameraman dixebitî û ji bo nûçeyan çûye Sûrê, wê demê li ber çûna rojnamegeran a wê herêmê tu astengên fermî tunebû, ne qedexe bû.

**23ê Îlonê, 2022**

**Tirkiye di cîhanê de welatê duyemîn e ku herî zêde hunermend girtine**

Rapora 'Azadiya Hunerî ya 2022an' hat weşandin ku ji aliyê FreeMuse ve hatiye amadekirin. Li gorî daneyan, Tirkiye di sala 2021an de di nava welatên ku herî zêde hunermend lê hatine girtin de li Ewropayê di rêza yekemîn de û li cîhanê di rêza duyemîn de ye. Hat diyarkirin ku ji 24 welatên cîhanê 119 hunermend hatine girtin. Di daneyên darizandinê de Tirkiye bi 49 kesan di cîhanê de yekemîn e. Li Tirkîyeyê hejmara hunermendên girtî 20 e, di sala 2021an de 19 hunermend ketin girtîgehê.

**Di doza îşkenceya li Onur Yaser Can de polîsan di belgeyan de sextekarî kirine**

Der barê girtenameya îfadeya Onur Yaser Canê ku întîxar kir de, ji bo 4 polîs û pisporekî bi îdiaya ku di belgeyan de sextekarî kirine doz hat vekirin. Can dema di girtîgehê de bû rastî lêgerîna tazî, zext û îşkenceyên giran hat. Piştî ku hat berdane bi hinceta ku înzeya wî kême careke din ji emnîyetê bang lê kirin. Di êvara heman rojê, di 23ê Hezîrana 2010an de xwe ji qata sêyemîn a xaniyê xwe avêt û dawî li jiyana xwe anî. Temenê wî 28 bû.

Xwişka Can, parêzer Ezgî Sevgî Can ragihand ku, "Polîs dîsa bi sextekariya belgeyan tîna sêdarkirin, lê ez ê di her firsendê de bêjim ev doza îşkencê ye." Rûniştina yekem dê di 30ê Îlonê de pêk were.

**Konferansa "Îmamê Hevzayend" ji ber "zexta medyaya civakî" hat betalkirin.**

Konferansa Dr. Ludovic Mohamad Zahed ku bi navê "Îmamê hevzayend" tê naskirin, a di çarçoveya Brand Week Istanbulê de ji ber "zexta medyaya civakî" hat betalkirin. Piştî ku navê Zahed li lîsteya axêveran hat zêdekirin, dijberên LGBTI+ li ser medyaya civakî banga boykotkirina sponsorên çalakîyê kiribûn.

Organîzatoran ragihand ku biryara betalkirinê bi Zahed re hatiye dayîn.



**27ê Îlonê, 2022**

**Konsera Mem Ararat a li Mêrsînê hat betalkirin**

Konsera hunermendê Kurd Mem Ararat ku dê di 27ê Îlona 2022an de li Mêrsînê bihata lidarxistin, ji aliyê Walîtiya Mêrsînê ve hat betalkirin.

Hunermend di daxuyaniya xwe de wiha got: "Di derdora saet 17.00an de em nêzî Mêrsînê bûbûn, hevalên me yê ji organîzasyonê ragihand ku polîsan bi rêya telefonê xwe gihandine wan û gotine ku konsera me bi biryara walîtiyê hatiye betalkirin. Mixabin konsera me rojek beriya konserê ji aliyê Walîtiya Mêrsînê ve hat betalkirin."

Bi vî rengî, ji Gulana 2022an û vir ve bi giştî 10 festîval û 19 konser hatine betalkirin.

**28ê Îlonê, 2022**

**HUDA-PAR, Partiya Saadetê û Partiya Ji Nû ve Refahê wekî hedef nîşan da û konsera Irem Derici hat betalkirin**

Konsera Irem Derici ji ber ku HUDA-PAR, Partiya Saadetê û Partiya Ji Nû ve Refahê ew hedef girtin, hat betalkirin. Konser dê di mihrîcana "Salçalı Kofte ve Gastronomi" de ku ji teref Odeya Xwaringeh û Şîranîfiroşan a Elezîzê ve hatibû lidarxistin pêk bihata. Serokê Odeya Xwaringeh û Şîranîfiroşan a Elezîzê ku yek ji sponsorên festîvalê ye Zulfu Tarhan, diyar kir ku ji bo logoya Walîtiyê ji afîşan bê rakirin zext hatiye kirin.

Bi vî rengî, ji Gulana 2022an û vir ve bi giştî 10 festîval û 20 konser hatine betalkirin.